Bêhtir fîrmayên pêşketî

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Ew civata ku ji bo perwerdeyê xwedî hêz e, hêza wê ya berberiya li nav civatê heye û dıkare xwedî ewletiyê be – ev modêla me ya ji bo bêhtirkirina afirandina derfeta xebatê ye. Bi xêra vê modêlê, ev deh salên dawiyê pêşketinên bilind ên civakî hatine holê û fayiz kêm bûye. Di nav van salên dawiyê de 300 000 derfetên kar hatine afirandinê. Ev baş e, lê ne bes e.

Bêhtir perwerde û lêkolîn
Em Sosyaldemokrat, me divê ku Swêd berdewam be li ser riya berberiya zanebûn û jêhatîbûnê – ne ku mûçe werin kêmkirin û xebatên ne ewle hebin. Swêd serê her şêniyekî xwe, ji temamê welatên cîhanê bêhtir li ser lêkolîn û pêşketinê dixebite. Em nuha gihane armanca xwe ya ji Hatina Tibaba Giştî ya Millî (BNP) 1% bi ser karê lêkolînê ve here, ku ev pere ji kîsê me yê beşdar e. Em derfeta lêkolînê bi 2,3 milyar kronî bêhtir dikin. Em xwendegeha bilind (högskolan) bi 17 500 cihî bêhtir dikin. Em 900 milyon kron li ser lêkolînên ji bo fîrmayên biçûk dirazînin. Ji bo berzkirina kvalîteyê, ji bo tevayiya şagirdan bikaribin xwe bigehînin armanca xwe, temamê dibistan û xwendegehan pere ji hikûmetê wergirtine, da ku ew bikaribin 15 000 mamoste û pîsporên din bixin ser kar. Xwendegeha lîseyê ya pîşesaziyê, (yrkesförberedande gymnasieskolan) ew ê bêhtir pêş ve here. Her wisan jî ev bi alîkariya destpêkirina perwerdeya hevdem ya şagirdiyê (lärlingsutbildning) ya li nav warê xebatê pêk were.

Bêhtirbûna hêza berberiyê
Li nav van 20 salên dawiyê wekî bi çendî vê dema dawiyê fîrmayên nuh ne hatine damezirandinê. Ev baş e û em ê li ser riya hêsantirkirina ji bo fîrmagerên biçûk berdewam bin, da ku ew bi hêsanî bikaribin bibin xwedî fîrma û pêş ve herin.

Fîrmageriya biçûk
Divê gerek fîrmagerên biçûk (småföretagare) xwe ewle bibînin. Ji ber vê hindê em dixwazin merc û rewşa firmageriyên biçûk ên pêwîstiya wan bi piştgiriya civakî heye, baştir bikin, ji bo nimûnê dema nexweşketinê.

Ji bo hêsankirina kar û barê fîrmageriyê, em li tevayiya welêt derfet li ser şêwirmendiyê bêhtir dikin. Her wisan jî, em karê burokratiyê ji ser 300 gavî bêhtir kêm dikin. Fîrmagerên li temamê herêman divê bibin xwedî heman keysa baş ji bo wergirtina sermayê ji bo pêşketinê û avakirina derfeta xebatê ji bo gelek kesan. Du milyar kron li ser debarkirina bi sermayeya rîskê (riskkapitalförsörjning) dihê danînê.

Her wisan em bi taybetî kêmkirina bacê ve mijûl in. Bi taybetî ji bo pêwîstiya fîrmagerên biçûk: li ser rakirina baca mîratê û diyariyê, ji bo kêmkirina pereyê karmendiyê (arbetsgivaravgift) ji bo fîrmagerên ku bi tenê (enmansföretagare) cara yekê ji xwe re karker digrin. Her wisan jî milyar kron baca kêm li ser fîrmayên kêmkarker (fåmansbolag).

Bi razandina milyar kronî ji bo hêza berberiya bêhtir di nav çend branşên ku ji bo aboriya Swêdê bi taybetî jî gerek in, bi vê riyê em çeper û penahên aboriya Swêdê zexm dikin. Milyarek wê li ser bêhtirkirina derfetê ji bo firokê- û fezayê, dar- û daristaniyê, metalurgî, IT- û telekomê, her wisan jî li ser dermansazî û bîotêknîkê here. Her wisan jî em pêngavek beşdar bi îndustriya otomobîlê dikin, da ku em otomobîlek ji dewrûberê xwe re kêrhatîtir ji xwe re biafirînin.

Ewlebûn û vekirîbûn Swêdê ava dike
Mirovên ji xwe ewle wêrek in û xwe dikin xwedî berpirsiyariyek mazin. Ewlebûn hêz û jêhatîbûna me zexmtir dike, gava ku dewr diguhere, em xwe nuh bikin.
Ewlebûn pêşketina bêhtir derdixe holê û her wisan jî gelek ji derfetên kar û xebatê. Lê belê vekirîbûna ber bi pêş dunyê ve û ber bi kirinên çak ên nuh, ew jî wek ewlebûnê tiştên grîng in. Ev hevbendiyek e di navbera ewletî û vekirîbûnê, ku di nav van deh salên dawiyê de Swêda me li nav berberiya cîhanî kiriye qezenckar. Em dixwazin li ser vê ramyariyê berdewam bin.

Alternatîva vê – Swêdek feqîr
Em Sosyaldemokrat dixwazin, ku vê modêla xwe bi riya bêhtirkirina derfeta ji bo perwedeyê, bêhtirkirina hêza berberiyê û bêhtirkirina ewletiya ji bo her kesî pêş ve bibin. Em bi vî rengî li Swêdê pêşxistina berdewamî ya bilind diafirînin
û her wisan jî mişe derfetên kar û xebatê.

Ew hevbendiya rastê (högerallians) ya Moderatan dixwazin bervaciyê vê ramyariyê pêk bihênin. Ew dixwazin ji ser vê modêla swêdî derbas bin. Ew dixwazin bacê ji bo wan kesên ku pir pere qezenc dikin kêm

bikin, rewşa ewletiyê xirab bikin, pileya pereyên bêkariyê (a-kassan) û sîgorteya nexweşiyê (sjukförsäkringen) kêm bikin. Ev modêla hevbendiya rastê derfeta pêşketinê ne diafirîne. Di ser de jî cudahiya derfeta aboriyê di navbera mirovan de bêhtir dike û Swêdê ber bi paş ve dibe.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?